MYNDIGHETEN FÖR
TILLGÄNGLIGA MEDIER

# Peymana bikaranîna Legimusê, kitêbxaneya dîjîtal ya MTM-ê

Legimus kitêbxaneya Daîreya medyayên berdest [MTM-ê] ye. Li vê derê, tu dikarî kitêbên dengdar dakişînî û kitêbên brailleyî (yên ji bo koran) û hwd. deyn bikî. Tu dikarî agahdariyan li ser xizmetên MTM-ê û pêşniyazên kitêban werbigirî.

• Kitêb li gor Qanûna mafê talîfê parastî ne û tenê heqê wan kesan heye yên ku ji ber seqetiyekê xwandina tekstên çapkirî ji wan re zehmet e wan bi kar bînin.
• Gava tu kitêba dengdar dadikişînî yan têxî Bokhyllanê [Refa kitêban], ew wek deynkirî tê hesab kirin. Dema deynkirinê 6 meh in. Tu kitêbê vedigerînî bi rêya ku tu wê ji refê bavêje.
• Agahdariyên daxilbûnê û kitêb ji bo bikaranîna şexsî ya te ne û çênabe mirov wan bide kesên din.

## Çi dibe heger ez peymanê bi cih neînim?

• Heger tu peymanê bi cih neînî, heqê tê yê bikaranînê wê xizmetê namîne.
• Belavkirina neqanînî ya kitêbên dengdar li gor qanûna mafê talîfê sûc e û mimkin e bibe sebeba doza mehkemeyê. Gava kitêbên dengdar tên dakişandin, ew bi agahdariyên kesê deyndar tên nîşan kirin. Heger kitêbbeka dengî neqanûnî bê belav kirin, MTM dikare deyndarê kitêbê bişopîne.

## Parastina agahdariyan

MTM agahdariyên te yên şexsî li gor Qanûna parastina agahdariyan (GDPR, 2016/679/EU) diparêze û bi kar tîne. Nav, e-poste û nimreya şexsî [personnummer] yan tarîxa jidayikbûnê û nimreya naskirinê ya karta LMA-yê di qeyda bikarhîneran ya MTM-ê de tên qeyd kirin. Nav, e-poste û nimreya şexsî [personnummer] û yan tarîxa jidayikbûnê û nimreya naskirinê ya karta LMA-yê divê her wext di qeyda bikarhîneran de hebin. Heger tu dijî qeydkirineka weha bî, MTM nikare hesabekê [kontoyekê] çê bike.

Mimkin e ew agahdarî ji bo pêkanîna lêkolîn û nirxandinên statistîkî derbarê xizmetên me bên bi kar anîn. Her dem heqê te heye ku tu qebûl nekî ku ji bo lêkolînan têkilî bi te bê kirin. Tu dikarî wê bi rêya “Mina Sidor” [Rûpelên Min] di legimus.se de yan bi rêya kitêbxaneya xwe bikî.

Kesên ku agahdariyên wan yên şexsî parastî û veşartî ne dikarin daxwazê bikin ku ew agahdarî di beşekê sirveşartinê yê qeydê de bên parastin. Li wê derê tenê nimreya şexsî [personnummer] û
e-poste yan tarîxa jidayikbûnê, nimreya naskirinê ya karta LMA-yê û
e-poste tên qeyd kirin. Tenê hejmareka sinordar yan karmendên MTM-ê dikarin agahdariyan bibînin.

Agahdariyên zêdetir li ser ka em çawa agahdariyên şexsî bi kar tînin di siyaseta me ya serweriya şexsî de hene. Ew di www.mtm.se/hantering-av-personuppgifter/ de hene

Heqê MTM-ê heye ku ji ber sebebên bidelîl qaîdeyên bikaranînê biguhere. Tu wek bikarhînerê Legimusê mecbûr î ku bi serê xwe ji guhertinan agahdar bibî û bê derenghêlan û gîrokirin Xizmeta bersivdanê ya MTM-ê agahdar bikî heger tu dijî wan guhertinan bî.. Heger tu dijî guhertinan bî, ew tê wê maneyê ku MTM dikare bi serê xwe îmkana bikaranîna Legimusê îptal bike.

Ez sozê didim ku li gor peymanê tev bigerim û xwe derbarê guhertinên mihtemel de serwext bikim.

Ev peyman di 2018-05-22 de hatiye nû kirin û hêj berdewam e.